



Bixêr bê n bo Swedbank û Sparbankerna ê

Bo tomar kirina wekî mişterîyeke Swedbank yan bankeya kompere, dibe hejmareka nasînê pêşkêş bikin û şîrove bikin ka pêdivîya we bi hesaba bankî çî ye. Eve rênasîyeke ku dibe li dema serdana beşê, radestî bankê bikin.

Kartna nasnamê

Eger we hejmara nasnameya Swedî heye

Eger we hejmara nasnameya Swedî heye, dibe karteka nasnameya Swedî radest bikin.

Eger we hejmara nasnameya Swedî tune ye.

Eger we hejmara nasnameya Swedî tune ye. Dibe hûn nasnameyeka netewî ya nirxdar nîşan bidin ku hevvelatîya we nîşan bide, pêşkêş bikin.

Bo welatên ku beşekin ji Girêbesta Şengen, hemberîya karta nansnameya netewî ya Swedî jî ku nîşandera hevvelatîtîya we ye, nirxdar e.

Dema karteka nasnameya bîyanî radest dikin, ev karte dibe gel belgeyeka dî, wekî izina rûniştinê, gotinnameya şolê, û bawername ji rêveberîya bacê yan bawernameya perwerdehîyê, bê pêşkêş kirin.

Eger zimanê Inglîzî yan Swedî nizanin

Eger zimanê Inglîzî yan Swedî nizanin, dibe kesekê ku bikare babetan ji were wergêr, bi xwe re bînin.

Dibe em bikarin gotinê hev fem bikin, heta ku ji maf û pêdivîyên xwe wekî mişterîyek agadar bin û emê bersivê pirsên xwe liser we û rewşa we ya malî, werbigirin.

Çima dibe min hesaba bankî hebe?

Tevahîya bankeyên Swedê ji hêla qanonî berpirsin ku bipirsin çima dibe we hesaba bankî hebe? Gengaze bixwazin mûçe yê xwe yan derhatîyê xwe yê dî, xerc nekin, diravê kîrrê bidin yan hesabeka kompere we hebe.

Gelek bankeyên me bi diravê next kar nakin. Bi vê sedemê dibe hûn ji banka xwe bipirsin ku çawa dikare pê bikaranîna şeweyên xênjî şeweyên neqd karên malî û diravdanê xwe pêk bînin.

Agahîyên karta banka we û hesaba we şexsî ne. Nabe kesê dî kart û hesaba we bikar bînin. Balkeşe ku hûn agahîyên kart û hesaba xwe biparêzin. Qet PIN kodeya xwe nedane ber destê kesek dî.

Eger bo vergirtina piştîvanîya derhatê pêdivîya we bi vegotina hesabê ji aliyê banka xwe hebe, dibe hûn serdana nêzikîrîn beşa bankê di nêzî herêma xwe da bikin daku ev di qeyd kirina bo vegotina bankî ya mehane bi belaşî alîkarîya we bikin.

Mafê bikaranîna hesaba bankî

Hemî kes, bê berçav girtina hevvelatîya wan, ji mafê vekirina hesaba bankî ku bin sîya Qarantîya Kompere be, mîfa darin. Lê di hinek babetan da bank dikare, dest ji vekirina hesabê ji were berde. Bank di rewşê jêr da nikare ji were hesabê vebike:

- bank nekare kesayetîya we bide naskirin
- bank bizane agahîyên ku we liser vekirina hesabê radest kirine, ne bes in

Pêşnîyarên destpêkî

Pêşnîyarên me yê destpêkî ji were derfet diden ku Diravê xwe kom bikin û rêjeya diravdana xwe rêveberî bikin.

Ev pêşnîyarane pêk tên ji:

- Hesaba bankî
- Karta bankî
- Xizmetên diravdanê



Rastî

Liser Zagona Xebatên Dijî Paqijkirina Diravê Nerewa û Dabîn Kirina Malî ya Terorê

Zagona Xebatên Dijî Paqijkirina Diravê Nerewa û Dabîn Kirina Malî ya Terorê zagoneke Swedî ye ku dixwaze ji bikaranîna xerab a bankan bo pêkanîna sextekarîyên bacê û dabînkirina diravî bo xebatên tawanbarî bergirî bike. Ser ev esasa ev zagonê, eger bank li hember sedema ku mişterî dixwaze hesabekê veke û çawa vê bikar bîne, bersiveka kêrhatî vernegire, mafê vekirina hesabê tune ye.

Liser Qarantîya Kompere

Swedê Qarantîya Kompere heye Eve bi ev wate yê ye ku eger bank têkbiçe, dewlet zîyana mişteryan, heta rêjeyeka taybet, tê bide.

Liser diravê neqd

Swedbank, bankeyên kompere] bankeyên dî û سهامداران, bo kêmkirina rêjeya diravê neqd di geryanêdi civakê da gelek dixebitin. Bi ev sedemê, em ji mişteryan re pêşnîyar dikin ku dirav danê xwe bi rêya karta xwe bikar bînin, dema dirav danê pê kartê di firoşgehan, diravê neqd bistînin, û ji dezgehê kompere yê neqdî û ATM an bo dan û standina pere bikar bînin.